Hozanê Ciwan: Xelîl Derbas

Ew di sala 1975 an de li gundê Dirêcîkê, Herêma Tirbespiyê (Suriya) hate diniya yê. Malbate wî di sala 1989 an de ji Gundê xwe Koçberbûn û li Elmaniya bûne Mêvan. Bavê Hozan Xelîl bi xwe sitranbêj bû, ji ber wê yekê jî Xelîl bêtir bi muzîkê ve hate girêdan û di sala 1990 bala xwe bêtir dabû ser lêxistina temburê û paşî xwe hînî bizqê kir. Di sala 1995 an de kasête xwe yê yekê **Reqsa Kurmancî** belakir û bi dilekî germ ji aliyê ciwanan ve hate himbêz kirin. Her weha jî kasêta 2an: **Dilê min,** kasêta 3an: **Bextê dinê**, kasêta 4an: **Tuyî perçek ji min** û kasêta 5an: **Silav neda** û di îsal de amedekariya kasête xwe ya 6an dike.

Li ser nivîsîna gotin û awazan, hozan Xelîl got: "Dinav her pênc kasêtan de tenê sê helbest û awaz ne yên minin, wekî din hemî gotin û awaz min bi xwe cêkirin." Her wisa dibêje: "Ez hîvî dikim ji hemû hozanên ciwan, bila gotin û awazên wan ne durî filklor û kultira Kurdî bin."

Josef Keleş